NÛÇEYÊN KURDÎ STANDARDÊN NAVNETEWEYÎ...

05
HEJMAR

# BOTAN TIMES

EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

## BIRÎNÊN ERDHEJÊ TÊN PÊÇAN

BOTAN TIMES

**Ber bi taxeke din, ber bi gundekî an jî bajarekî...**

Beril Caymaz

**10 erdhejên mezin ên li Tirkiyeyê**

Beril Caymaz

**DFG: 17 rojnameger di erdhêjê de mirine**

Botan Times



BOTAN TIMES
*Nûçeyên kurdî, standardên navneteweyî...*
Xwedî
**Botan International Medya Ltd. Şti.**
Edîtor/Nûçegihan
**Gulistan Korban Rençber**
**Berîl Caymaz**
Edîtor
**Murat Bayram**
Wergêr
**Yonca Sarsilmaz**
Rûpelsazî
**Ridwan Xelîl**
Bergsazî
**GrafîKURD**
www.botantimes.com

**BOTAN INTERNATIONAL MEDYA LTD.**
Xwedî
**Murat Bayram**
Midûr
**Yonca Sarsilmaz**
Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan
**Kubra Sagir**
Şêwirmendê Weşanê
**Omer Faruk Baran**
www.botaninternational.com

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY
Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.

BOTAN TIMES

BULTENA HAFTANÊ YA NÛÇEYAN



# NAVEROK

7 ziman heye lê Kurdî nîn e! ............ 4
Roja 14emîn ya erdhêjê ............ 5
Ber bi taxeke din, ber bi gundekî an jî bajarekî... ............ 6
Roja 13emîn ya erdhejê ............ 8
10 erdhejên mezin ên li Tirkiyeyê ............ 9
Roja 12emîn ya erdhejê ............ 11
Wêne-nûçe: Avahiyên dîrokî jî nekaribûn xwe li ber erdhêjê bigrin ............ 12
RSF: Piştî erdhêja li Tirkîyeyê azadîya çapemenîye gelek caran hatiye binpêkirin ............ 14
Roja 11emîn ya erdhêjê ............ 15
"Tesîra erdhêjê ya li ser dêrûniya me kir dibe ku bi mehan derbas nebe" ............ 16
Roja 10emîn ya erdhêjê: Hêvî hêj heye! ............ 17
Ji ber erdhêjê gelo dibe ku dîroka hilbijartinê bê guhertin? ............ 19
DFG: 17 rojnameger di erdhêjê de mirine ............ 21
Roja 9ê ya erdhêjê ............ 22
Roja 8emîn ya erdhêjê: Kê çi got? ............ 24
Welatî ji ber çi naçin kamp, mekte, mekteb û mizyeftan û li ser kavilan dimînin? ............ 25
"Li Amedê di 200 avahiyan de ziyanên mezin hene" ............ 26
Semsûr: Bêhina miriyan ketiye kolanan û yên sax ji serman diqefilin ............ 28

# 7 ziman heye lê Kurdî nîn e!

Gulistan Korban   Sibat 19, 2023




Foto-Twîtter,@yimer157, SS

Erdhêja 6ê sibatê bandorê li 10 bajaran kir. Le ji wan bajaran gelek jê bajarên kurdan bûn.

Li gel wê jî Navenda Ragihandina Biyaniyan (YÎMER) ku li bajarên wêran bûyî xebatê rizgarkirina welatiyan bi rê ve dibir cîh neda kurdî.

YÎMER di bangawaziya de bi 7 zimanan xizmetên wergerandinê da, lê di nav wan de kurdî nîn bû.

**Baroya Amedê serlêdan kir**

Baroya Amedê jî li gel vê bi daxwaza ku kurdî jî li navenda bangawaziyê ya YÎMER 157an bê zêdekirin, serlêdan kir.

Baroyê di serlêdana xwe de xwest ku zaravayên kurmancî û kirmanckî yên kurdî jî li YÎMER'ê bê bar kirin.

YÎMER girêdayî Wezareta Îdareya Koçê ya Tirkiyêye û bi awayekî çalak di xebatên rizgarkirina erdhejê de cih girt.

**Zimanê Petuşca heye le..**

Sazî tevî zimanê Tirkî bi 7 zimanan xizmetên rizgarkirinê û alîkariyê pêş dike.

Lê balkêşe ku li gel li bajarên Kurdan xebatên rizgarkirinê dikin cîh nade zimanê Kurdî.

**@yimer157**

*YİMER 157 7 Dilde (Türkçe, Arapça, Farsça, İngilizce, Rusça, Almanca, Peştuca) Tüm Deprem Bölgelerine Tercüme Desteği Vermektedir. Tercüme Desteği İçin 157'yi arayabilirsiniz.*

Ev yek jî bû sedema nerazîbûnan.

Bikarhênerên medyaya civakî jî dibêjin, "Wan kurdên di bin kavilan de man wê bi zimanê Elmanî alîkarî bixwazin."

**@avsuphiozgen**

*Çima #Kurdî tuneye?*

*Niye #Kürtçe yok?*

*Where is #Kurdish*

*Depremin vurduğu 10 ilimizde en fazla Kürd vatandaşımız yaşamıyor mu?*

*Enkazda kalan sadece Kürtçe bilen depremzede Almanca Rusça ile mi iletişim kurucak? @ RTErdogan*

*@suleymansoylu  @drfahrettinkoca*

Bajarên wekî Semsur,Meletî, Mereş, ku ji ber erdhêjê wêran bû hejmarek zêde kurd li van bajaran dijî.

Lê li gel wê ji saziyên dewletê di ragihandinan de cih nade kurdî.

# Roja 14emîn ya erdhêjê

Gulistan Korban  Sibat 19, 2023



Binnivîsa Wêne

Pîştî erdhêjên bi navenda Mereşê çêbûn hejmara kesên jîyana xwe ji dest da jî rojana bilind dibe.

Li gorî daneyên herî dawî ku ji aliyê AFADê ve hatiye belavkirin 40 hezar û 642 kesan jiyana xwe ji dest daye.

**1772 cenaze ji Tirkiyeyê şandin Sûriyeyê**

> **13:30** *Navenda Mafê Mirovan ya Surîyeyê ragihand ku termên hezar û 772 penaberên ku di erdhejên li Tirkiyê de jiyana xwe ji dest dane şandin Sûriyê.*

**Piştî erdhejê 10 hezar û 633 Sûriyeyî bi dildarî vegeriyan warên xwe**

> **12:10** *Wezîrê Parastina Neteweyî Akar dîyar kir ku,piştî erdhejê 10 hezar û 633 Sûriyeyî bi dildarî vegeriyan warên xwe." daxuyanî da.*
>
> *Wezîr Akar got, "Hin ji planên îxlal û fesadiyê îdiayên 'ji sînoran hatina penaberan' hatin kirin. Ev îdia bi tevahî ne rast in."*

**Li Mereşê erdhej çêbû**

> *Resetxaneya Kandîlliyê daxuyand ku li navçeya Goksun a Mereşê bi pileya 5,3 erdhej çêbûye. Erdhej li gelek bajar û navçeyan hat hîskirin.*

**Jinên ji karesatê rizgar bûne: 'Pêdiviyên me nayên bicihanîn, em xwe ewlehîyê de hîs nakin'**

> *Gelek jinên ku ji erdheja ku li 10 bajarên Tirkiyeyê qewimîn xilas bûn, piştî karesatê yekser ji ber "korbûna zayendî" ya alîkariyê gazinan dikin. hinek di stargehên qelebalix de dijîn û ji ewlekariya xwe û zarokên xwe ditirsin.*

**Rasatxaneya Kandîlî eşkere kir**

> *Rasatxaneya Kandîllî dîyar kir ku, Erdheja di saet 04:17an de bi 3 lerzê pêk hat û zêdetirî 80 saniyeyan berdewam kir.*

**Pispor piştî erdhejên li 10 bajaran hişyariya nexweşiyên enfeksiyonê didin**

> *Prof. Dr. Yavuz got, "Piştî van hefteyan ji ber kêmasiya binesaziyê divê em di warê nexweşiyên enfeksiyonê û belavbûnê de pir baldar bin. Ji bo em hemû amadekariyan biqedînin ev hefte hefteyek pir krîtîk e. Derfeta me heye ku bindestkirin.*

# Ber bi taxeke din, ber bi gundekî an jî bajarekî...

Beril Caymaz Sibat 18, 2023




Binnivîsa Wêne

Di ser erdhêjê de 13 roj derbas bûn.

Îro li Amedê wek rojeka biharê bû. Li bajêr şûna kuçe û kolanên sar ên ji ber erdhejê mayî hewayeke germ hebû. Kolan qelebalix bûn.




Ez ji bo dîtina konên ku bo mexdûrên erdhejê li parka Koşuyoluyê hatine vedan ji Derê Çîyê ber bi Ofîsê ve meşîyam.

Gelê Amedê wek 13 roj berê bi lez û bez dikevin karê xwe, firoşgehên vekirî û tije, ciwanên li qehwexaneyan rûniştine...

Alîyekê ve Amedê êdî vedigeriya jiyana xwe ye normal.



Lê alîyekê din ve jî kesên bêmal hebûn. Hê jî nekarîn ji bandora erdhejê derbikevin.

Li parka Koşuyoluyê nêzî 100 kon hatine vedan. Li vir qelebalixek hebû. Ji ber hewaya tavê gel ji konên xwe yên sar derketibûn derve.







Li her du aliyên parkê rê hebûn. Dora parkê tenê bi barên hesinî hatibû dorpêçkirin.

Di parkê de tevliheviyek mezin hebû. Polîs li derveyî parkê disekînin.

Dema ku bi dehan zarokan li ser pêlîstokan kêfa xwe dikirin, hinekan jî li ber konên ku ji bo wan hatibûn vedan stran digotin û govendê digirtin.

Ji bilî konên ku ji aliyê Afadê ve hatibûn vedan, konên ku mexdûrên erdhêjên bi derfetên xwe vedanibûn jî hebûn.

Jinên ku di hembêza wan de zarok hebûn min dan sekinandin û gotin:

> *Jimara min binivîse, alîkariya me bike. Kon pir sar in, malên me xera bûne, em nikarin biçin.*

Ji alîyekê din ve kesên ku li kolanên teng û kevn de dijîn, ji mala xwe ya xerabûyî bar dikirin.

Ber bi taxeke din, gundekî an jî bajarekî...

# Roja 13emîn ya erdhejê

Beril Caymaz Sibat 18, 2023



Binnivîsa Wêne

**12.22** Midûriyeta Parêzgeha AFADê: Li Diyarbekirê xebatên lêgerîn û rizgarkirinê yên hemû avahiyên ku ji ber erdhejê hilweşiyane bi dawî bûne.



Li gorî daxuyaniya AFADê hejmara miriyan derket 39 hezar û 672 kesan. Hejmara birîndarên di 108 hezar û 68 bû, hejmara erdhejên biçûk jî 4 hezar û 734 e.

Daneyên herî dawî yên li seranserê bajarê Amedê:

> *Ji ber erdhejê 401 kes mirin. 902 kes jî birîndar in.*
>
> *Tê texmînkirin ku di bin kavilên Galeryayê de 6 kes hene.*




Di saet 278an a erdhejê de li Hatayê kesek bi saxî ji binê xirbeyan hat derxistin.

Balafira alîkariyê ya 12emîn a ku Erebistana Siûdî şandibû gihîşt Tirkiyeyê.

Li Hatayê di saet 296a ji bin kavilan 3 kesên ku yek jê zarok bû bi saxî hatin derxistin.

# 10 erdhejên mezin ên li Tirkiyeyê

Beril Caymaz  Sibat 17, 2023



Arşîv: Erdhêja Wanê, 2011 Wêne: Pixabay

**Erdhêja Wanê – 2011, Cotmeh**

Erdhêj di 23ê Cotmeha 2011an de li Wanê di seat 13.41an de pêk hat. Bi pileya 6,6 pêk hat û 25 sanîyeyan dewam kir.

Navenda erdhejê gunde Tabanlîyê ku 17 kîlometre dûrî Wanê ye, bû.

Di vê erdhejê de 604 kes jiyana xwe ji dest dan. 4 hezar û 152 kes jî birîndar bûn.

**Erdhêja Çewlîgê – 2003, Gulan**

Erdhêja Çewlîgê sala 2003an di 1ê Gulanê de seat 03.27an bi pileya 6,4 pek hat.

Li hêremê herî kêm 176 kesan mirin û 625 avahî hilweşiyan. Dema bloka li dibistana şevînî ya li Celtiksuyu hilweşîya 84 kesan jiyana xwe ji dest dan.

**Erdhêja Duzceyê – 1999, Mijdar**

Di 12'ê Mijdara 1999'an saet 18:57'an de erdheja bi mezinahiya 7,2 pêk hat.

Erdhêja ku 30 saniye dewam kir, li gelek parêzgehan û her wiha li Ukraynayê jî hat hîskirin.

845 kes mirin û 4 hezar û 948 kesan jî birîndar bûn. 12 hezar û 939 xaniyên zirarên mezin dîtin.

**Erdhêja Golcukê – 1999, Tebax**

Erdhêja ku navenda wê Kocaeli/Golcukê ye di 17ê Tebaxa 1999an de danê sibê saet di 03:02 de pêk hat. Erdhêja bi hêza 7,5 mw li gor pîvana Richterê xisareke mezin a canî û madî pêk anî.

Erdhêja 17ê Tebaxê ji Enqereyê heta Îzmîrê li tevahiya Herêma Marmarayê hat hîskirin.

Li gorî raporên fermî 17 hezar û 480 kes mirine û 23 hezar û 781 kes jî birîndar bûne. 505 kes jî seqet bûne. 285 hezar û 211 xanî û 42 hezar û 902 kargeh zirar dîtine.

**Erdhêja Edenê û Ceyhanê – 1998, Hezîran**

Li Çukurovayê di 27ê Hezîrana 1998’an de li gorî saeta herêmî saet 16:55’an de erdhêjek pêk hat.

Erdhêj bi pileya 6,2 pêk hat û 145 kes mirin, hezar û 500 kes birîndar bûn. Bi hezaran kes jî bê mal man.

**Erdhêja Erzincanê – 1992, Adar**

Erdhêja ku di 13ê Adara 1992an saet 19:08 de li Erzincanê pêk hat.

Hêza erdhêjê 6,8 pile hat pîvan. 653 kes mirin, 8.057 avahî hilweşiyan.

**Erdhêja Erziromê – 1983, Cotmeh**

Erdhêja 30ê Cotmeha 1983an ku li Erzirom û derdora wê xisareke mezin dabû, pêk hat.

Pileya erdhejê 6,9 bû û hezar û 155 kes mirin, 537 kes jî birîndar bûn. 3 hezar û 241 xanî zirareke mezin dîtin. Zêdetirî 30 hezar heywan telef bûn.

**Erdhêja Çaldiranê – 1976, Mijdar**

Erdhêja Wanê ku navenda wê navçeya Muradiye bû bi pileya 7,5an, 24ê Mijdara 1976an di saet 12:22an de pêk hat.

3840 kes mirin û 9232 avahî zirar dîtin.

Ji bilî erdhêjê, ji ber sermayê ku bi şev germahiya hewayê li herêmê daket -17 pile, mirin zêde bûn. Ji ber baran û berfê xebatên rizgarkirin û alîkariyê dereng mabûn.

Di erdhejê de herî zêde ziyanên canî û madî li Muradiye û navçeyên derdorê Erciş û Ozalpê çêbûn. Li Çaldirana ku nifûsa wê 3 hezar û 304 kes e, ji sedî 95ê xanî hilweşiyan û 615 kes mirin.

Piştî erdhêja Erzincanê ya sala 1939an a bi lerza 7,9 Ms erdhêja herî dijwar bû ku li Anatolyayê hat dîtin.









# Roja 12emîn ya erdhejê

Beril Caymaz  Sibat 17, 2023




Piştî erdhejên bi lerza 7,7 û 7,6 ya li Mereşê hejmara qurbaniyên di erdhejê de jiyana xwe ji dest dane zêde dibe.

**Serokê Odeya Pîşesaziyê ya Kocaelîyê bang li karsazan kir : Kesên ji herêma erdhejê hatine îstihdam nekin**

> *Serokê Odeya Pîşesazî ya Kocaelîyê Ayhan Zeytinogluyê got "Divê em nifûsa kedkar bînin vê derê. Daxwaza min ew e ku hûn kesên ku ji erdhejê tên îstihdam nekin. Em nabêjin ku alîkariyê nekin lê îstihdam nekin.*

**Di roja 12emîn de dengek ji kavilan hat**

> **11.45** *Piştî erdhejên li Maraşê Apartamanê Defne yên li Antakyayê jî hilweşiya. Di roja 12emîn a erdhejê de di bin kavilan de deng û germ hat tesbîtkirin. Tîmên diyar kir ku di bin kavilan de 3 kes hene. Xebatên lêgerîn û rizgarkirinê berdewam dike.*

**2 kes di bin kavilan de hatin derxistin**

> *Li Antakyayê piştî 261 seatan Mehmet Alî Şakîroglu yê 26 salî û Mustafa Avcî yê 34 salî ji xirabeyan hatin xilaskirin.*

**Azra ya 4 salî ku ji binî kavilan hat derxistin, li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da**

> *Azra Duru Malaç a 4 salî li Antakyayê di bin xirbeyan de mabû. Di encama xebatên lêgerîn û xilaskirinê de sax hatibû ditîn. Azra yê li Nexweşxaneya Perwerde û Lekolîne ya Bajarê Edeneyê jiyana xwe ji dest daye.*

**Hejmar her ku diçe bilind dibe**

> *Li gorî daxuyaniya AFADê di erdhejê de 38 hezar û 44 kesan jiyana xwe ji dest dane. Li herêmê 4 hezar û 734 erdhejên biçûk pêk hatine.*

# Wêne-nûçe: Avahiyên dîrokî jî nekaribûn xwe li ber erdhêjê bigrin

Nûçegihan   Sibat 16, 2023



Wêne- Twîtter- @dkulturtabiat

Erdhêja 6 Sibatê ya bandorê li 10 bajaran kir, him di warê canî him jî di warê çandî de rê li ber zirareke mezin vekir.

Li Antakya,Mereş Amed, Semsur gelek avahiyên dîrokî jî ji vê zirarê para xwe girtin.

Komeleya Parastina Mîrateya Çandê ya Amedê ji bo tespitkirina wan ziraran beriya cend rojan dest bi kar û xebatan kir.

Komeleyê di navbera 9-11ê Sibatê de li ser Keleha Amedê ziraran di cîh de tespît kir û bi wêneyan ev yek pişt rast kir.


Di wêneyên hatin belavkirin de jî hate dîtîn ku keleh zirareke ciddî dîtiye.

Hinek beşên dîwarên Sûra Amedê hilweşiyan. Hatiye ragihandin ev beşên ku hatine hilweşandin di asta restorekirinê de bûn û di rojê pêşerojê de dihatin restorekirin.













Keleha Amedê xwedî dîrokek 5 hezar salî ye.Di lîsteye Mîrateya Çandî ya Cîhanê de cîh digre û bi dehan şaristaniyan re malovaniyê kiriye.

Bedena Amedê 100 metre li jora Geliyê Çemê Dîcleyê ye û ji keleheke hundir û derve pêk tê.

Di sala 20215an de ji aliyê UNESCOyê ve ketibû listeya divê bê parastin.

Her wîha ne tenê li Amedê li Semsur û Antakyayê jî avahiyên dîrokî hilweşîyan.

Li Adiyamanê stûna destan a li Tumula Karakuşê ya 2 hezar salî ji ber erdhejên navenda Mereşê hilweşiya.

Li Antakyayê jî ku ji ber erdhêjê kevir li ser kevir nema, Dêra Azizler Petrus PAvlus jî ji erdhêjê para xwe girt û hilweşîya.

UNESCO, di derbarê hilweşandina avaniyên dîrokî ku di zirarê dîtine da daxuyaniyeke belavkir.



arkeofili
@Arkeofili · Follow

Adıyaman'da, Kahramanmaraş merkezli depremler nedeniyle 2.000 yıllık Karakuş Tümülüsü'nde bulunan tokalaşma sütunu yıkıldı.

8:42 PM · Feb 12, 2023

Read the full conversation on Twitter

971 Reply Copy link

Read 27 replies

Di daxuyaniyê de anî ziman ku ew ê envantera cihên dîrokî û çandî derxin û ji bo restorasyonên cihên dîrokî di demeke kurt de dest bi xebatan bikin.



Tezcan KARAKUŞ CANDAN #MustafaKemalinMemuru
@tezcandan · Follow

Adıyaman'da tarihi ulucami yerle bir olmuş kalanınıda kepçeyle onlar hallediyor, kültürbilmezlik böyle işte @halktv @ankahabera @tele1 @gazetesozcu @BirGun_Gazetesi @gazeteduvar @kisadalgamedya @gercekgundem @ArtiTV_ @Kucukkayalsmail @TCKulturTurizm @mimodank

1:28 PM · Feb 14, 2023

418 Reply Copy link

Read 23 replies



arkeofili
@Arkeofili · Follow

Antakya'da Tarihi Azizler Petrus ve Pavlus Kilisesi Yıkıldı

arkeofili.com
Antakya'da Tarihi Azizler Petrus ve Pavlus Kilisesi Yıkıldı - Arkeofili
Antakya'da yer alan tarihi Azizler Petrus ve Pavlus Kilisesi'nin, 6 Şubat'ta meydana gelen şiddetli depremde yıkıldığı bildirildi.

1:42 PM · Feb 11, 2023

69 Reply Copy link

Read 2 replies

# RSF: Piştî erdhêja li Tirkîyeyê azadîya çapamenîye gelek caran hatiye binpêkirin

RSF Rojnamegerên Sînornenas  Yonca Sarsilmaz  Sibat 16, 2023



Rojnamgerên Sînornenas (RSF) dibêje ku ji roja ewil ya erdhêje ve rojnamger hewl didin rewşa qadê bişopînin. Lê rojnameger ji alîyê rayedarên Tirkîyeyê ve gelek caran bi awayan cuda tên astengkirin. Ew bangê li rayedaran dike ku dawî li wan zeftên li ser rojnamegeran bînin. Divê rayêdar rêzê li ber karên wan bigire.

RFS ji roja ewil ya erdhêjê ve wan zordestî û zeftên ku li rojnamegeran tê kirin dişopîne. Şîdeta fîzîkî, girtin, dozên edlî, êrîşen înternetê û astengkirina Twitterê ji wan hinek in.

Rojnameger bi hinceta "navkirêtkirina polîs û dewlete" hatin sûcdarkirin. Hewldanên kontrolkirina rojnamegeran ji alîyê rayedaran ve her ku diçe bêtir xuya dibe.

> *Rayedarên Tirkîyeyê divê vê trajedîya li Tirkîyeyê bi astengirina rojnamegeran zêdetîr bi kar neynin. Astengkirin, êrîş, girtin, bûyerên tehdîtkirina rojnemgeran divê bê rawestandin. Rojnameger di nav wan şertên xirab de tenê karên xwe dikin. Nûçeyan wan ji her kesî re ji her wextê bêtir giringtir e.*
>
> *Nûnerê RSF'ê li Tirkiyeyê Erol Onderoglu*

**Hin ji wan kesên ku rastî êrîşkirin, ji qadê derxistin, girtin, tirsandinê û astengkirinê hatine:**

Mahmut Altintaş: Nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê

Sema Çaglak: Nûçegihana malpera nûçeyan a JinNewsê

Mehmet Gules: Nûçegihanê MA'yê

Ferît Demîr: Nûçegihanê televîzyona Halk TVyê

Ji bo agahîyên zêdetir, dikarin bixwînin: Nûçeya RSFyê

# Roja 11emîn ya erdhêjê

Gulistan Korban Sibat 16, 2023



Piştî erdhejên bi lerza 7,7 û 7,6 ya li Mereşê hejmara qurbaniyên di erdhejê de jiyana xwe ji dest dane zêde dibe.

**Li Hollandayê ji bo mexdûrên erdhejê bi qasî 89 ewro hat berhevkirin**

> *Li Hollandayê ji bo mexdûrên erdheja lî Tirkiye û Sûriyeyê kampanyaya alîkariyê hat organîzekirin. Di weşana hevpar a qenalên televîzyonê de nêzikî 89 milyon (88 milyon û 921 hezar û 469) ewro hat berhevkirin.*

**Di seat 248an de keçeke ciwan ji bin xirbeyan hat rizgarkirin**

> **12:28** *Li Mereşê di seat 248an de keçeke ciwan ji bin xirbeyan hat rizgarkirin.*

**AFAD: Hejmar bilind dibe**

> **11:48** *AFADê ragihand ku hejmara kesên canê xwe ji dest dane derketiya 36 hezar û 187 kesan.*

> *Her wiha hate gotin ku 108 hezar û 68 kes jî birîndar bûne.*

**Wezîrê Derve yê Amerîka Blinken dê roja Yekşemê bê Tirkiyê**

> **10:17** *Wezîrê Derve yê Amerîka Antony Blinken dê roja Yekşemê serdana Tirkiyê bike û li ser xebatên alîkariyê yên piştî erdhejê gotûbêj bike.*

**AFADê lîsteya pêdiviyên "Pêşî" eşkere kir**

> **09:00** *AFADê lîsteya pêşîn a malzemeyên alîkariyê yên ji bo herêmên erdhejê eşkere kir.*
>
> *Di lîsteyê de tiştên alîkariyê yên wekî çadir, betanî û xwarinên hişk hene.*

**Di kampanyaya 'Yek Dil Tirkiye' de 115 milyar alîkarî hatin komkirin**

> *Di kampanyaya alîkariyê ya ku bi weşana hevpar a gelek qenalên televîzyonê hat lidarxistin de 115 milyar 146 milyon TL alîkarî hat berhevkirin.*

**Li Amedê 15 kes hatin girtin**

> *Li Amedê di encama erdhejê de 394 kesan jiyana xwe ji dest dan. Di çarçoveya lêpirsîna derheqê avahiyên hilweşiyayîn de 39 kes hatibûn binçavkirin û ji wan 15 jê hatin girtin.*

**Ji bo zarokên ku mexdurê erdhejê ne kampanyaya "Konê listikê" destpê kiriye**

> *Li Amedê ji bo zarokên ku ji erdhejê bandor bûne kampanyaya "Konê Lîstikê" hatiye destpêkirin.*
>
> *Gulan Onkolê diyar kiriye ku ew him ji bo bexşên konan û him jî ji bo bexşên pêlîstokan amade ne.*
>
> *Yên ku dixwazin bi kon û pêlistokan piştgiriyê bide zarokan dikarin têkiliyê bi vê hejmarê re deynin: 0 505 623 2751*

# "Tesîra erdhêjê ya li ser dêrûniya me kir dibe ku bi mehan derbas nebe"

Gulistan Korban | Murat Bayram | Sibat 15, 2023


Piştî erdhêja Semsûrê

Erdhêja Mereşê li 10 bajaran tesîrê li 13 mîlyon mîrovan kir.

Li gel bi ser erdhêjê hefteyek zêde wext derbas bibe jî li gor Dêrûnas Suna Gûvenê tesîra wî ya dêrunî wê ewqas hêsan derbas nebe.

Di nava kesên ku erdheje jiyane û yê nedîtine de tirsa erdhejê dest pê kiriye.

Hê jî gelek mîrov li kolanane û  ji ber tirs û xova erdhêjê nekarin bikevin malên xwe.

Mirov çawa dikare bi van tirsan re mijûl bibe?

Erdhêj derûniyeke çawa bi mirvon re peyda dike?

Derûnas Suna Guven bersiva van pisan dide..

> *Erdhêj tesîra şokê bi ser dêrûniya mirovan dike. Ji bo mîrovan cîhê herî bi ewle malên wan e. Dema di malên xwe bi erdhêjê re rû bi rû dimînin û nekarin xwe bi parêzin ev yek jî dêrûniya wan gelek bi bandor dike.*
>
> *Derûnas Suna Guven*

Li ser encamên erdhêjî Guven van tiştan dibêje,

> *Li ser her keseke tesîreke cuda dike. Beden û rih ji vê felaketê re bertekek neasayî nîşan dide.Bêçaretî, bêhêvîbûn, rewşa panîkê, kabûs dikarin çêbibin. Hin caran jî tesîra wî piştî 3-6 mehan ango bi salan derdikeve hole.*

Suna diyar dike ku kesên derûniya wan bibandor bûye divê ji dêrûnaseke alîkariyê bistîne.

Li cem wan kesan divê behsa erdhêjê neyê kirin. Li ciheke germ û bi ewle divê bên bicîh kirin.

**"Terapiyên onlîne dide"**

Guvena ku li Elmanyayê dijî ji bo kesên ji erdhêjê bibondor bûne li ser zoomê dest bo terapîyên onlîne kiriye. Guven dibêje,"

> *Ji destê min ev dihat, min encax karibû bi vê şeklê alikariya gelê xwe bikim.*

Ji niha de ji gelek bajaran hejmareke zêde kesên ji erdhêjê bibandor bûne bo terapiyan serîlan kiriye.

**Ji bo kesên bixwazin serîlêdan bikin jî Derûnas Guven vê peyamê belavkiriye.**

*Gelê meyê hêja, Ez dixwazim ji bo kesên ku ji erdhejê bandor bûne re piştgiriya derûnî bikim. Ji bo vê yekê ezê dê danişînên terapiya serhêl bi rêya Zoom-ê çêbikim. Kesên ku dixwazin beşdarî van Danişînên terapîyê bibin dikarin bi min re têkilî daynin.  Piştî ku serlêder hatin destnîşankirin, dê dîrok û dema terapiya li ser zoomê were destnîşankirin.*

*Ji bo ragihandinê:* **sunagueven@hotmail.com**

*Nîşe: Ji kerema xwe ji xeynî mexdûrên herêma erdhejê serî nedin.*

# Roja 10emîn ya erdhêjê: Hêvî hêj heye!

Gulistan Korban  Sibat 15, 2023



Piştî erdhejên bi lerza 7,7 û 7,6 ya li Mereşê hejmara qurbaniyên di erdhejê de jiyana xwe ji dest dane zêde dibe.

Li gorî daneyên herî dawî 35 hezar û 418 kesan jiyana xwe ji dest da.

Li gorî agahiyên ji aliyê AFADê ve hatiye belavkirin 195 hezar û 962 mexdûrên karesatê ji herêmê bo

parêzgehên din hatine veguhestin.

**Kiliçdaroglu: Bi zanebûn leşkeran neşandin**

> *Serokê CHPê Kemal Kiliçdaroglu dîyar kir ku hikûmet bi zanebûn leşkeran neşandiye herêma erdhêjê.*

**Wezîr Kurum: 50 hezar û 576 avahiyên ku divê bi lezgînî bên hilweşandin hene**

> *Wezîrê Hawîrdor û Bajarvaniye Murat Kurum dîyar kir ku li gorî tesbîtên heta niha 50 hezar û 576 avahî hene ku divê bi lezgînî bên hilweşandin.*
>
> *Wî anî ziman ku li herêma erdhejê xebatên tesbîtkirina ziarê dewam dikin û heta niha 387 hezar û 346 avahî hatine lêkolînkirin.*
>
> *Hat diyarkirin ku 279 hezar û 655 avahî sivik zirar dîtine yan jî zirar nedîtine.*
>
> *13:09*

**Soylu: Li Antakyayê ji her 2 malan yek**



**wêran e**

*Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylu li Mereşê civîna çapemeniyê li dar xist û got, "Li Antakyayê ji her 2 malan yek wêran dibe."*

*11:09*

**Wezîrê Derve yê Ermenîstanê dê bê Tirkiyê**

*Wezîrê Derve yê Ermenistanê Mîrzoyan bo başkirina têkiliyên Tirkiye û Ermenistanê îro serdana Tirkiyê dike.*

*11:00*

**Yekem karwanê alîkariyên NYyê ji deriyê sînorî derbasî Sûriyê bû**

*Karwana alîkariyê ya yekem a Neteweyên Yekbûyî ji deriyê sînorî yê nû vebû derbasî Suriyê bû.*

*10:00*

**3 hezar û 170 erdhejên din jî çêbûn**

*Her wîha li gor daneyên AFADê hat gotîn ku li herêma erdhêjê 3 hezar û 170 erdhejên din jî çêbûne.*

**2 hezar avahî hilweşiya**

*Li Semsûrê û li navçe û gundên wê nêzî 2 hezar avahî hilweşiyane. Li gorî daneyên ewil zêdetirî 8 hezar avahî jî wekî avahiyên zêde xesar dîtine hatine tespîtkirin*

**Li Semsurê di seata 222an de 2 kes hate rizgarkirin**

*Li bajarê Semsurê ku bi erdhêjê wêran bê hê jî welatî ji bin kavilan bi saxî tên rizgar kirin.*

*DI roja 9'an a erdhejê de, li Semsûrê li Taxa Alîtaşiyê Fatma Gungor a 77 salî bi saxî ji bin kavilên Apartmana Merveyê hat derxistin.*

*Zarokê 12 salî Berat Yucel pişti 9 rojan hate xelaskirin.*

# Ji ber erdhêjê gelo dibe ku dîroka hilbijartinê bê guhertin?

Gulistan Korban Sibat 10, 2023


Binnivîsa Wêne

Di van rojên ku li herêma erdhejê hîn xebatên lêgerîn û rizgarkirinê berdewan dike, tê gotin baskê desthilatdariyê ji bo paşxistina hilbijartinan dest bi xebatan kiriye.

Heta 6ê Sibatê rojeva herî girîng ya Tirkiyeyê hilbijartinên serokomarî û parlementoyê bû.

Lê belê piştî erdhejên li Maraşê ku li 10 parêzgehan bû sedema wêraniyeke mezin, hilbijartin "ji bo niha" ji rojeva hikûmetê û ya mûxalefetê derket.

Niha jî ji ber erdhêjê taloqkirina hilbijartinan di kulîsên Enqerê de tê axaftin.

Erdheja Mereşê li 10 bajaran rasterast bandor li 13,5 mîlyon kesî kir.

**Li herêmên erdhêjê 9 mîlyon hilbijêr henin**

Li gorî daneyên hilbijartinên 2018an, li 10 parêzgehên ku ji ber erdhêjê wêran e 8 milyon hilbijêr hene. Niha ev reqam 9 milyonan derbas kiriye.

Tê payîn ku li 10 bajaran nêzîkî 9 milyon hilbijêr ji bo dîyarkirina serokomar û 91 parlementeran biçin ser sindoqan.

Li gorî zagona Tirkiyeyê divê hilbijartin di 18ê Hezîrana 2023an de bên kirin.

Lê belê Serokomar Recep Tayyîp Erdogan di hemû daxuyaniyên xwe yên beriya erdhejê de bo hilbijartinan 14ê Gulanê îşaret kiribû.




**Hîkûmet dikare hilbijartinan paşde bixe?**

Niha ev tişt tê miraqkirin, lê gelo hikûmet dikare roja hilbijartinê ya ku wek 14ê Gulanê hatibû ragihandin paşde bixe?

Di 9'ê Sibatê de yekem car rayedareke AKPê gotibû, "Di rewşeke wiha de nabe hilbijartin pêk were. Niha dîroka 14'ê Gulanê zehmet e."

**CHP: Ji ber ku şer tune ye, hilbijartin nayê taloqkirin**

> *Li gor Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kiliçdaroglu taloqkirina hilbijartinan ne mumkun e.*
>
> *Kiliçdaroglu got, "Destûra Bingehîn pir zelal e. Lê di şert û mercên şer de hilbijartin tê taloqkirin. Ji ber ku şer tune ye, hilbijartin nayê taloqkirin. Kes nikare bi hincetên xwe pîvaneke hiqûqî ya yekta biafirîne."*

**Arinç: Ne di meha Gulanê û ne jî di Hezîranê de hilbijartin çênabin**

> *Serokê berê yê Meclîsê Bulent Arinç xwest ku hilbijartin bên taloqkirin.*
>
> *Arinç gotîbû, "Divê welat di zûtirîn dem de ji stresa hilbijartinan xilas bibe. Ne di meha Gulanê û ne jî di Hezîranê de hilbijartin çênabin."*

**Demîrtaş: Darbeyek siyasî ye!**

> *Hevserokê berê yê HDP'ê Selahatîn Demîrtaş jî dibêje, "Biryara paşxistina hilbijartinan bi awayekî eşkere darbeyek siyasî ye."*

**Akşener: Wê di 18ê Hezîranê de çêbibe**

> *Seroka ÎYÎ Partiyê Meral Akşener jî got, "Ez bawer nakim ku hilbijartin bigihêje 14'ê Gulanê, lê ez difikirim ku di 18'ê Hezîranê de çêbibe.*

**Deva: Ne Serokomar û ne jî YSK nikarin hilbijartinê taloq bikin**

> *Berdevkê Partiya DEVA Îdrîs Şahîn da zanîn ku ne Serokomar û ne jî YSK nikarin hilbijartinê taloq bikin.*

**Zagon çi dibêje?**

*Di xala 78'an a Destûra Bingehîn de tê gotin ku hilbijartin ji ber şer bi biryara TBMMê tenê salekê dikare were taloqkirin.*

*Yanî li gorî destûre, hilbijartin ji bilî şer ji ber sedemeke din nayê paşxistin.*

# DFG: 17 rojnameger di erdhêjê de mirine

Botan Times   Sibat 14, 2023

Komeya Rojnamegeran a Dîcle-Firatê lîsteya rojnamegerên di erdhêjê de mirîne weşand. Li gor lîsteyê jimara rojnamegerên di erdhêjê de mirîn 17 e.

**Burak Milli**
(Anadolu Ajansı, Hatay)

**Gökhan Aklan**
(İhlas Haber Ajansı, Hatay)

**İzzet Nazlı**
(Demirören Haber Ajansı, Hatay)

**Ayşe Figen Arlı**
(İskenderun Ses gazetesi, Hatay)

**Burak Alkuş**
(Adıyaman Ses Haber)

**Kemal Öner**
(Türkiye Spor Yazarları Derneği'nin Adıyaman temsilcisi)

**Fatih Bayın**
(Radyo Tek, Adıyaman)

**Zübeyir Pektaş**
(Halkın Sesi gazetesi, Adıyaman)

**Yunus Emre Doğan**
(Mercan TV, Adıyaman)

**İskender Korkut**
(Mercan TV Programcısı)

**Aziz Çevik**
(Maraş Manşet Gazetesi)

**Hidayet Özdemir**
(Gündem Gazetesi, Adıyaman)

**Muhammed Akan**
(Adıyaman Haber)

**Ruhi Akan**
(Jet Haber, Adıyaman)

**Neşet Alkan**
(Haber Ekspres, Hatay)

**Mustafa Yüzbaşıoğlu**
(Maraş Bugün Gazetesi)

**Meltem Özgen**
(MaviFM, Adana)





Dicle Fırat Gazeteciler Derneği · Feb 14, 2023
@DFGDernegi · Follow
Replying to @DFGDernegi
1/2
Burak Alkuş (Adıyaman Ses Haber)
Kemal Öner (Türkiye Spor Yazarları Derneği'nin Adıyaman temsilcisi)
Fatih Bayın (Radyo Tek, Adıyaman)
Zübeyir Pektaş (Halkın Sesi gazetesi, Adıyaman)

Dicle Fırat Gazeteciler Derneği
@DFGDernegi · Follow

1/3
Yunus Emre Doğan (Mercan TV, Adıyaman)
İskender Korkut (Mercan TV Programcısı)
Aziz Çevik (Maraş Manşet Gazetesi)
Hidayet Özdemir (Gündem Gazetesi, Adıyaman)
12:18 PM · Feb 14, 2023

4 Reply Copy link
Read 1 reply

# Roja 9ê ya erdhêjê

Gulistan Korban, Murat Bayram  Sibat 14, 2023



Piştî erdhejên bi lerza 7,7 û 7,6 ya li Mereşê bi hezaran kes li herêmên karesatê bi xetereya nexweşiyê re rû bi rû man.

Hejmara qurbaniyên di erdhejê de jiyana xwe ji dest dane ji 30 hezarî bihûrî.

Tedawiya bi deh hezaran welatî jî li nexweşxaneyan berdewam dike.

Pîştî 198 seatan li du bajaran 3 kes ji bin kavilan hatin rizgarkiri.

Li bajarê Semsurê ciwanek, li Mereşê jî du jin ji bin kavilan hatin derxistin.

Bi deh hezaran kesên ku hê şîna xwe negirtine bo ewlehiya canê xwe ji bajarên xwe koç dikin.

Li herêmên erdhejê bi milyonan mirov bi pirsgirêkên bêavî û hîjyenê ku dibin sedemê xetereya şewbê re rûbirû mane.

**UNICEF: Erdhêjê zerer daye zêdetirî 7 milyon zarokan**

> *Berdevkê Saziya Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) James Elder li Cenevreyê daxuyanî da rojnamevanan û wiha got:*
>
> *Li 10 bajarên li Tirkiyeyê erdhêj lê çêbûyî zerer li 4,6 milyon zarokan bûye. Li Sûriyeyê zerer li 2,5 milyon zarokan bûye.*
>
> *15:00*

**Diyarbekir: Mitehidên desteserkirî serbest in**

> *Dozgerîya Diyarbekirê ji bo lêpirsîna herifîna avahîyan 31 kes desteser kiribûn. GazeteDuvarê ragihand ku ew kesên desteserkirî hatine berdan.*

**Erdogan: 81 hezar birîndar hatin derman kirin**

> *Serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan ji Civîna Hikûmetê ya Cîhanê ku li Îmarata Yekbûyî yên Ereban tê lidarxistin re vîdeoyek şand.*
>
> *Erdogan li ser rewşa mexdurên erdhêjê agahiyan da û dîyar kir ku,*
>
> *"Me ji 81 hezar welatiyên xwe yên ku ji erdhejê bi birîndarî hatin rizgarkirin beşeke girîng derman kir.*
>
> *Ji aliyê ekîbên lêgerîn û xilaskirinê zêdeyî 8 hezarî welatiyên me ji xirbeyan bi saxî hatin derxistin.*
>
> *14:39*

**Serokê Herêma Kurdistanê li Intabê(Dîlok) ye**

*Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî çûye Intabê. Vê gavê li navenda hewargihandinê ya AFADê ye.*

*12:40*

**HDP: We li ber çavan sûc kir, êdî hûn nikarin sûcên xwe bi gotina 'qeder' veşêrin**

*Navenda Partîya Demokratîk ya Gelan (HDP) ji Twitterê gotinên Parlementer Garo Paylan yê sala 2020an belavkir.*

*Paylan di axaftina xwe de  li dijî efûya herêman a sala 2020an derdikeve û dibêje, "Eger Xwedê nehêle erdhejek çêbibe, eger welatiyên me di binê avahiyê de bin, wê kî heqê wê bide?"*

*12:16*

**France24: Balafireka Erebistana Siûdîyê dada Şamê**

*Televizyona France24 ya Fransayê diyar kir ku balafireka barê wê tiştên ji bo mexdûrên erhêjê ne dadaye Balafirxaneya Şamê.*

*Ev demek bû alîkarîyên mirovî ji bo Tirkiyeyê dihatin lê Sûriye hatibû piştguhkirin.*

*12:00*

**NY: Beşar Esadî qebûl kiriye ku ji bo alîkarîyan du derîyên sînorî yên Sûriyeyê dê bêne vekirin**

*Li gor BBCyê Neteweyên Yekbûyî diyar kiriye ku ji bo alîkarîyan du derîyên sînorî yên Sûriyeyê dê bêne vekirin. Beşar Esadî jî ev daxwaza NYyê qebûl kiriye.*

*11:30*

**Ji ber çi li cihên erdhêj çêbûyî şebekeyên telefonan çû?**

*Pispora Telekomûnîkasyonê Füsun Sarp Nebilê ji BBCyê re eşkere kiriye ku li wan bajaran bi tenê binesaziya teknîkî ya TurkTelekomê heye. Xetên dî yên wek Vodafone û Turkcellê operatorên xwe bi wê xetê ve girê dane. Xetên telefon û înternetê di tekela yek şirketê de ye. Dema ew têk çû hemî xet têk çûne.*

*11:00*

**AA: Parlamenterên Koreya Başûrê dê beşek ji mehaneya xwe ji bo mexdûrên erdhêjê bişînin**

*Ajansa Anadolûyê da zanîn ku parlamenterên Koreya Başûr dê ji sedî 3yê mehaneya xwe ji bo mexdûrên erdhêjê bişînin.*

*Pere dê ji bo parastina xwendekar û geştiyarên Koreyî û ji bo xelaskirina mexdûrên erdhêjê bê herckirin.*

**MLSA: Li bajarên erdhêj çêbûyî 4 rojnameger hatine desteserkirin**

Komeleya Medya û Hiqûqê (MLSA) diyar kir:

*Li bajarên erdhêj heyîn herî kêm 4 rojnameger hatine desteserkirin, 9 rojnameger hatine astegkirin û êrîş li 8 rojnamegeran hatiye kirin.*

**"Nexweşiyên şewbê dê belav bibin"**

*Yekitiya Tabîbên Tirk (TTB) hişyarî dabû heke pêşîlêgirtin ango tedbîr neyê girtin dê li herêmên erdhejê nexweşiyên şewbê jî belav bibin.*

*TTB dîbêje "li herêma erdhejê di warê nexweşiyên infeksiyonê de em di "serdema herî bi xeter" de ne.*

*Divê di zûtirîn dem de tedbîr bên girtin."*

**Bahçelî pîştî 7 rojan axivî**


*Serokê Giştî yê MHPê Devlet Bahçelî jî pişti 7 rojan derket peşberi kamerayan.*

*Bahçelî bo rexneyên di derbarê wî de got, "Ji bo ku ez mudaxeleyî xebatên rizgarkirinê yên bi hûrgilî û hesas nekim, geşedanên ji Enqereyê dişopandim."*

"Ez ê li Osmaniye, Kahramanmaraş, Hatay, Adiyaman, Amed, Şanliurfa, Gazîentab, Kilîs, Edene û Meletiyê bi gelê xwe re bibim yek deng û bi dorê serdana wan bikim."

# Roja 8emîn ya erdhêjê: Kê çi got?

Gulistan Korban   Sibat 13, 2023   Çavkanî: BBC Turkçe, DW,Kısa Dalga


Piştî erdhêjê Hatay

Erdhêjên bi lerza 7,7 û 7,6 pêk hatin li 11 parêzgehan xisareke mezin çêkir.

Hejmara kesên di erdheja 6ê Sibatê de jiyana xwe ji dest dan 31 hezaran derbas kir.

Tê gotin ku ji 80 hezarî zêdetir mirov jî birîndar bûne.

Di nav van kesan de xebatkarên lêgerîn û rizgarkirinê û xebatkarên alîkariyê jî hene.

Her wiha li gorî daxuyaniya AFADê piştî erdhejê 2 hezar û 724 erdhejên biçûk çêbûne.

Hejmara xebatkarên lêgerîn û rizgarkirinê yên ji derveyê welat hatine Tirkiyeyê jî 9 hezarî derbas kir.

**Bozdag: Di derbarê 134 kesan de lêpisîn hate destpêkirin**

Wezîrê Edaletê Bekîr Bozdagê dîyar kir ku derbarê 134 kesên berpirsiyariya wan di avahiyên ruxiyayî de hebûye lêpirsin dane destpêkirin.

Ji wan sê kes jî hatine girtin.

**TTBê bertek nîşanî biryara perwerdeya ji dûr ve da**

Biryar hatibû dayîn ku mexdûrên karesatê erdhêjê li wargehên Saziya Krediyê û Yurdan (KYK) bên bi cih kirin.

Yekitiya Tabîbên Tirk (TTB) bertek nîşanî biryara Lijneya Xwendina Bilind (YÖK) a ji bo perwerdeya ji dûr ve ya li zanîngehan da.

TTB jî dibêje, "Di perwerdehiya tibî de perwerdehiya ji dûr ve wê pêşî li şaşî û kêmasiyên nayên vegerandin veke.

em dixwazin YOK di zûtirîn dem de ji vê biryarê vegere û dev ji perwerdeya rû bi rû bernede."

**Alîkariyên ji derveyî welêt**

Piştî erdhejên Mereşê ji gelek welatan ekîbên lêgerîn û xilaskirinê hatin alîkariya Tirkiyeyê.

Yekîtiya Ewropayê (YE) ragihand ku ekîbên lêgerîn û rizgarkirin yên 20 welatên Yekîtiya Ewropayê û her wiha yê Arnavutluk û Karadagê ji bo biçin Tirkiyeyê seferber bûne.

Her wiha YEyê ragihand ku ew ji bo medxurên erdhêjê ji civaka navnetewî alîkariyê kom bikin dê di meha Adarê de konferansek li dar bixin.

Serokê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê Tedros Adhanom Ghebreyesus bo mexdurên erdhêjê got:

"Tîmên tenduristiyê yên lezgîn hatine aktîfkirin da ku lênihêrîna bingehîn a tenduristiyê bidin mirovên ku ji erdhejê bandor bûne."

Hat ragihandin ku malzemeyên ku dê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê dişîne Tirkiye û Sûriyeyê dê bi têrî 100 hezar mirovî bike.

# Welatî ji ber çi naçin kamp, mekte, mekteb û mizyeftan û li ser kavilan dimînin?

Murat Bayram Sibat 13, 2023



Semsûr, welatîyên li ser kavilekê li benda dîtina mirovên xwe

Piştî erdhêja bi pileya 7.7ê ya li Mereşê **jimara miriyan bûye 31 hezar û 643**. Hêj bi jimareka nedîyar kes li bin kavilan mane.

Hêvî ew e ku hin ji wan zindî bin. Ji bo wan kesên ji erdhêjê sax felitîn jî rewş xerab e. Ji bo yên mayîn tişta herî zehmet sermayî, nebûna cihê avdestê, nebûna ava paqij, nebûna ceyranê, nebûna an kêmbûna xetên telefon û înternetê û gelek kêmayên dî ne.

Ji bo çareseriya vê yekê "bajarên çadiran" têne çêkirin. Yanî kamp têne çêkirin. Lê gelek welatî naçinê. Em ê ji çavdêrî û hevpeyvînan sebebên sereke rêz bikin û dîyar e divê çadir li rexa xerabeyan bêne danîn.

> *Gelek avahî xera bûne lê xebatên ji bo derêxistina wan kesên li bin kavilî mayîn nînin. Mirovên wan kesan bi hêviya hin kesan an rêxistinan bînin ser wan kavilan nikarin/naxwazin dûrbikevin.*

> *Dayikekê got "min du caran qêrînîya keça xwe ji vê avahîyê bihîstiye bi kû ve biçim!" yekê jî got "sebr min li van xerabeyan jî tê, belkî neviyê min ê 4 salî hêj sax be" yanî ji aliyê derûnî ve naxwazin/nikarin dûr bikevin.*
>
> *Li benda sax an miriyên xwe ne. Dema termê mirovên wan têne derêxistin heger ew ne li wê derê bin li rexa xaniyan bêxweyî têne danîn an jî wek "kesên bêxwedî" ji bo nexweşxaneyan têne birin. Ew dixwazin xweyîtîya xwe li termên xwe bikin.*
>
> *Heger mirovên wan sax derbikevin dixwazin wê kêliyê li wê derê bin û xêrhatinê li wan bidin. Ciwanekê bi dengekê bilind bangî xuşka xwe kir û got "tu bi xêr hatî xuşkê, tu bi xêr hatî delala min!"*
>
> *Kavil wek cihekê hevgirîya digel mirovên xwe yên dî û cîranên xwe ye. Hêza xweragirtinê li wê derê dibînin.*

# “Li Amedê di 200 avahiyan de ziyanên mezin hene”

Gulistan Korban   Sibat 12, 2023



Piştî erdhêjê li Amedê yek ji avahiyên ruxiyayî-Dîyar Galeria

Piştî erdhêja ku wekî kareseta sedsalê tê binavkirin Wezîrê Hawirdor û Bajarvaniyê Tirkiyeyê Murat Kurum dîyar kir ku li 10 bajaran di 24 hezar û 921 avahiyan de ziyanên mezin hatine tespitkirin.

Li bajarê Amedê ji jî erdhêjê 7 avahî bi tevahî ruxiya, hejmara miriyan jî 321an derbas kiriye.

Rewşa avahiyên li bajarê Amedê me ji Serokê Odeya Endezyarên Înşaetê ya Amedê Mahsum Çiya Korkmaz pirsî.

**“Zirar bêtîr di avahiyên qeçaxde ye“**

> *Endamên me niha bi dildarî bi koma Jingeh û Bajarvaniyê ya Amedê re li avahiyên bajar digerin. Armanca me ew e ku xisarên piştî erdhêjê derxînin hole. Heta niha me di 200 avahiyan de xisarên ciddi tespit kir. Dîyar e hejmarê bilind bibe ji ber ku xebatên me hêj didome. Avahiyên zirar dîtine divê di demek nêz de bên ruxandin û li şuna wan avahiyên nû bên çêkirin.*
>
> *Mahsum Çiya*


Serokê Odeya Endazyarên Amedê -Mahsum Çiya

Wî diyar kir ku ew niha kar û xebatên xwe bêtir li navçeya baglarêli taxên Şehitlikê didomîn. Korkmaz sedema wî jî wiha tîne ziman;

> *Li van deran avahiyên kevn û bi kaçaxî hatiye çêkirin gelek e. Gelek ji wan jî bêyî ku endazyereke bibîne hatiye avakirin. Ji ber wê em rîska mezin li van deran dibînin.*
>
> *Mahsum Korkmaz*

Li gor Çîya, pirsgirêka herî mezin di rayedarên hikûmetê de ye û dibêje,

> *Hikûmet pergaleke bi navê "imar barışı" derxist û rê li ber avahiyên qeçax neqanûnî vekir. Bi hezaran kes bi pereyan vê mafê wergirtin û avahiyên qaçax avakirin."*
>
> *Mahsum çiya*

Erdhejên bi lerza 7,7 û 7,6an ku bi navenda Mereşê pêk hat 10 parêzgehan wêran kir.

Li gor daneyan heta niha 29 hezar kes mir. Bi deh hezaran jî birîndar bûn. Xebatên lêgerîn û xilaskirinê dewam dikin.

Wezîrê bajarvaniyê dîyar dike ku piştî erdhêjê heta niha li 10 parêzgehan 171 hezar û 882 avahî hatine lekolîn kirin.



Piştî erdhêjê li Amedê yek ji avahiyên ruxiyayî-Dîyar Galeria

# Semsûr: Bêhina miriyan ketiye kolanan û yên sax ji serman diqefilin

Murat Bayram | Murat Bayram | Sibat 12, 2023

Li Semsûrê li ser piranîya avahîyan ti komên xelaskirinê kar nakin. Bêhna miriyan ketiye kolan. Dûmaneka reş ji darên tê şewitandin bilind dibe. Bi wê dûmanê qalikekê reş li ser rûyê wan kesên derdorê çêbûye. Dîyar e demekê dirêj e li ber wî agirî ne.


Semsûr, Zûmrût Sîtesî

**Du rojan ti kes nehatin**

Li nav betenîyekê termek li rexa rêyê ye. Resul Tosun îro du caran çûye goristanê. Ji bo cara sêyem biçe li benda hatina du termên dî ye.

> *Ev ê li vê erdê birazîyê min e. Ew 10 salî ye. Tu dixwazî termê wî nîşanî te bikim. Parçe bûye. Bêhin ketîyê.*
>
> *Tam du rojan, tam du rojan kes nehatin. Li vê Zûmrût Sîtesîyê 64 malbat dijîn. Roja sêyem piştî nîvro dest pê kirin û beton rakirin. Me bi destên xwe hin kes xelas kirin lê çi ji me tê?*
>
> *Roja çarem termê birayê min û xanima wî derket min ew birin goristanê. Birazîyê min jî derket du xuşkên wî jî mane. 5 û 8 salî ne.*
>
> *Resul Tosun*


Resul Tosun (yê biçakêt)

Li derdorê xelk rêz bûne li benda derêxistina terman in. Naxwazin dûrkevin. Kêm çadir hatine danîn lê ew jî li cihên dûr in. Sar e. Welatî dicemidin. Em hemî bi hev re diqefilin.